Felsefeya cahiliyetê di îro de

Peywan Hesen

Got: Çend mehekan paş, em li welatê Norwêcê akincî bûn, rojekê ez bi xêzana xwe re, ji bo peyasê, derketim rexê bajêrî, ji nişkekê ve û ji bêşansiya wî jûjiyê xwelîser, çavê kurrê min yê deh salî pê ket. Yekser rahişt darekê û li dor teniştên jûjî zivirî ta ji hêz xist. Demê ku çavê polîsekê bi wî dîmenî dikeve, demildest jûjî ji nava dest û lepên me qurtal kir.

-Hûn çima lê dixin?

-Goştê wî pirr bi tam e!

- Lê, wî jî canê xwe heye û wek we diêşe!

- Xwedê kujtina wî helal kiriye.

- Hûn xelkê kûderê ne?

- Em xelkê Îraqê ne.

Piştî van pirsyaran, polîs bi me re hat û navnîşanên mala me li ser defterka xwe nivîsandin û her du rojên din, du kesên taybetmend dihatin mala me, tenê bi kurê min re rûdiniştin û basa felsefeya dilovaniyê bo wî dikirin.

Di van çend salên dawiyê de, her çu nebe, em hinek fêrî (dilovaniyê) û prensîpên demokrasiyê û bikarhanîna alavên wê bûn. Û heya radeyek mezin, boçûnên hevdij jî li cem me dihên qebûlkirin, bi kurtî û kurmancî, kesê Kurdistanê îro xwedî kesayetiyek cuda ye ji ya mirovê ereb, bi taybet ewê ku li bin desthelatdariya Bexdayê dijiya, ku bi baweriya min yêdî pirr giran e tu herduyan di yek biryara siyasî, jiyûgrafî de bicemînî. Li Kurdistanê, niha nêçîra giyaneweran qedexe bûye û wek gunneh dihê naskirin, li aliyê din, li cem ereban hêj serjêkirina mirovan, wek cîhadek pîroz dihê qebûlkirin. Dîrok dibêje, di çaxê (cahiliyan) de, pitiriya ereban û ji wan Omerê Kurrê Xettabî jî keçên xwe bi saxî binax dikirin, lewma li tolvekirinan, tenê bi xwarina goştê hevdu, rehet dibûn. Helbet ev çend vedigere bo dijwariya rewştê ereban, ku bi hişkiya siroştê biyabanê ve girêdayî ye, bi hêzên (fatihan) re ew rewşt weku kultur geha wan welatiyên nû hatîne vekirin û di nav wan de cihgîr bû. Bo nimûne, welatekê wekî Cezayirê, ku bi hezaran mîl ji Erebistanê dûr e û bi rêka Îslamê gelê wê bû ereb, niha kujtin û serjêkirina mirovan li cem grûpên wan yên îslamî karek pirr asan û normal e. Bêguman, ev yek li ser Îraqê jî dihê gotin, ku di binyat de Îraq welatek erebkirî ye. Tiştek din, ez dibêjim (vire) ku erebek çavşîn yan jî çavkesk û rûsipî hebe, ger ne duruh be, yan di koka xwe de ji nivşekê din be, bo nimûne, Mûsil (Nîneva) bajarek dîrokî ye û ji kevnatiya erebbûna Îraqê kevintir e. Lê, îro pirr ji erebbûyên çavşîn û çavkesk û rûsipî lê hene û pitiriya wan jî baweriyek mezin bi kulturê Gezîrta Erebî û tund û dijwariya wî kulturî heye, lê hember wan kesên erebbûyî, Mûsiliyê ne-erebûyî jî hene ku hêj li ser riha xwe mane, kurd,aşûrî mirovên aştîxwaz in û ji her dijwariyekê dûr in. Bi dîtina min, ya pitir vê yekê bi kar dihîne, germ dike, li cem erebbûyên tundrrew, peyrewkirina sîstemê lîbiral û bernameyê demokrasiyê ye li cîhanê. Herwesa berqerarbûna civakê medenî li pitiriya welatan, bi xwe yên kulturê Gezîrta Erebî, îro xwelwaz û bê desthelat û bername û kesatî lawaz li hember van guherînan dibînin, lewra xwe bi dîrokê ve girêdidin, wê dîroka ku ser dibirrîn û canên zindî binax dikirin. Ango, ya ku îro ereb dikin, em dikarin bi (selefiya cahiliyê) nav bikin, ku ereban herdem dîroka hêja naskirine û ta îro jî xwe pê serbilind dibînin.